DI MÎTOLOJIYA YÛNANIYAN DE

EVÎN Û SITÊRK HIRÇA MEZIN, URSA MAJOR (URSA MAYOR)

Silêman Demir

Demekê ji deman, mîrxweda Zeyus(Zeus), xwedayê erd û asmanî, dotmîreke Arkadî ya bi navê Callîsto dibîne û dil dikeve wê. Callîsto yek ji cêriyên Artemîs e. Artemîs keça Zeyusî ye, xwedaya nêçîrvaniyê ye.

Zeyus, rojekê di formê Artemîsê de diçe, xwe nêzîkî Callîstoyê dike, wê bi xwe re dibe û ji wê hez dike. Lawekî wî yê bi navê Arcas jê çê dibe.

Lê Hera, jina Zeyusî, banûya kayinatê, xweda zewacê û parêzgera zewaca pak, ji wê yekê aciz dibe, zikreş dibe, radibe Callîstoya sipehî dike hirçek mê û wê berdide daristanê. Ew yek ne bi dilê Zeyus bû, li ber delala xwe dikeve, lê Hera jî xwedayek mezin e, kirin û biryara wê nahê rawestandin. Dilê wî bi ser Callîstoyê ve dimîne û çavên wî her lê ne.

Gava Arcas mezin dibe û rojekê diçe nêçîrê, li dayika xwe, ya ku bûye hirç, rast dihê. Arcas niyaza kujtina wê dihîne. Zeyus dibîne û bîstika dawiyê pê re digehe û wê ji lepên wî xelas dike. Herduyan dibe asmanî û wan dike du sitêr Callîstoyê, delala xwe ya demekê dike heft sitêrkên bi navê Ursa Major-Hirça Mezin û Arcasî jî dike Pasevanê Hirçê.

Dunya û alemê, di vî navê latînî de, li hev kirine: Ursa Major e. Ango *hirça mezin* û ji çîroka wê delala Zeyusî dihê. Navê Callîstoyê niha li heyvekê ku li dora Jupiter e hatiye kirin.

(Gava min helbestên Mayakovskî wergerandin kurdî, navê Ursa Major

yê bi kurdî ji min re lazim bû û min jê pirsî. Gelek nav ji min re hatin gotin. Pirr neketin serê min.

Lê, camêrekê got: "dihê bîra min ku dayika min, ya ku niha heftêsalî, ji wan re digot ew hirçê ye". Ew yek ket serê min. Dêya wî li gundek mezin bibû, nivîsandin û xwandinê nedizanî. Ji ber hindê, ez bawer dikim ku navê hirçê, ji navê rast hatiye. Ji ber ku ez bi xwe bêguman im ku herêmên me jî demekê Zeyus wek xweda naskirine, hin ji keltûra Yûnanî û Romayiyan pîrozwer qebûl kirine, navên hinek tiştan ji wan girtine. Ji ber wê jî, min navê Hirçê rast dît û navê latînî werdigêrim bo kurdî. Di pirraniya zimanan de navê Hirça Mezin, li gel navên herêmî dihê gotin. Divê ku navê wê Hirça Mezin be, ji ber ku ya biçûk jî heye.)

Hirça Mezin, yek ji koma sitêrkên asmanî bakûr e, ya herî sipehî ye û bi hêsanî dihê dîtin. Lê, ev formê wan yê niha, ne herdem weha bû. Ji ber ku ew bi xwe jî li dora xwe û hevdu digerin, dîmenê wan dihê guhorîn. Lê, ji ber ku ew gelek dûrî me û hevdu ne, em bi hêsanî tê nahînin der. Berî sed salan, Megrez li jêrtir bû û Dubhe li jortir û li hêla destê çepê, li rasta Megrez bû. Herçî Alkaîd bû, ew li jor bû, li rasta Alcor-Mîzar bû. Alcor-Mîzar bêhtir nêzîkî hev bûn. Ji ber ku Alcor-Mîzar du sitêrk in û di rastiya xwe de dor çarekek sala ronahiyê dûrî hev in. Lê, ji ber ku ji dunyayê li ser xetekê dihên dîtin, wek ku li bal hev xuya dibin. Gelek sitêrk li gorî me weha ne. Hin jê xeta gera wan jî bi hev re ye. Dihê hijmartin ku wê sed salên din, Merak nêzîkî Phekda û Megrez bibe. Wê Dubhe hindekî dabikeve û hinekî ber bi destê rastê de here. Her çî Alkaîd e, ew ê bêhtir ber bi destê çepê de bihê.

Tiştê ku niha bi essehî dihê zanîn, ji wan pênc, yanî Merak, Phekda, Megrez, Alîot û Alcor-Mîzar, berê wan li cîhekê ye û bi xurtbûnek kêm- zêde wek hev digerin. Lê berê Alkaîd û Dubhe, ne li cîhekî ne, ew li dijî hev digerin. Ev yek dide zanîn ku ew herdu ne ji nebulosa her pêncên din çêbûne.

Belê, ji destpêka mirovayiyê, her heft bi hev re hatine dîtin û bi hev re hatine hijmartin. Ji wan re Ursa Major, yanî Hirça mezin hatiye gotin. Ew, delala Zeus Callîsto ye. Bi rastî, ne heft tenê ne, lê bi çavan ew tenê dihên dîtin.

Ji ber ku dunya li dora xwe digere, dîmenê hevgirtina sitêrkan dihê guhertin. Hirça Mezin bi xwe jî weha dibe. Êvarê zû, berê wê li jor e, ango Alkaîd li jor e, yên din li jêr in. Hindekê, derengiyê şevê, rast dibin. Heta sibehê, berê wan dikeve jêr.

Gava mirov li bakurê ezmên binere, mirov wan bi hêsanî dibîne.

Di Berbang hejmara 123 de sala 2002 derket.

Berî salekê jî di Pelînê de derketibû